

Wezareta Perwerdehiyê ya NSW

# Serlêdana ji bo ku zarokê min beşdarî dersa derfetê an lîseya bijarte bibe

## Çima perwerdehîya bijarte?

Berhevkirina xwendekarên jîr û jêhatî bi hev re û bikar anîna rêbazên hînkirina taybet, piştgiriya wan dike:

- pêşketina akademîk
- Tendirûstiya hestyarî; û
- Hevaltî û jiyana civakî.

Xwendekar ji me re dibêjin ku gava hevalên wan ên polê xwedî şiyan û berjewendîyên wekhev bin, ew ji hînbûna zêdetir kêfê distînin.

## Ji bo zarokê min rast e?

Li vir hin nîşan hene ku zarokê we dikare ji perwerdeya bijarte sûdê werbigire.

- Bi lez û bez hîn dibe
- Hankirîbûn
- pirsên aloz dipirse
- bîreke baş
- Meraqdar û afirîner
- Bi kûrahî berjewendîyan vedikole

Ji bîr nekin, dibe ku hin potansiyela zêde ya zarokan were veşartin. Di dersa firsendê da an jî lîseya bijarte dikare bibe alîkar.

NSW GOVERNMENT

# Ez çawa dikarim bi pêvajoya sepanê destekê bidim zarokê xwe?

Bi zarokê xwe re li ser **sûd** û **zehmetiyên** perwerdeya bijarte bipeyive û pirs û fikarên xwe bînin ziman.

Ji bo seqetî an jî rewşên tibî ji bo **sererastkirinên** maqûl yên pêwîst serî lê bidin.

Bînin bîra zarokê xwe ku ji bo testa bicihkirinê pêdivîya wan bi **amadekarîyeke biçûk** heye û pêdivîya wan bi perwerdeyê tune ye.

Ji **mamosteyê zarokê** xwe bipirsin (an jî xebatkarên din ên ku wan baş nas dikin) bifikirin ku perwerdeya bijarte dê li gorî zarokê we be yan na.

Zarokê xwe teşwîq bikin ku ji bo amadekirina testê **çavkaniyên belaş** ên beşê bi kar bînin.

Ji bo berdewamkirina çalakîyên **derveyî sinifê**, dîtina hevalan, bi tenduristî bixwin û di dema testê de baş razên, piştgiriyê bidin zarokê xwe.

**Modela Bicihkirina Edaletê**, ji bo yên jîr û jêhatî, **20 ji sedî ji cihên** dersên derfetê û lîseyên bijarte vedihewîne:

- Xwendekarên ji paşmayên kêm-civakî-perwerdeyî
- Aborjîn û / an xwendekarên Torres Strait Islander
- Xwendekarên ji cihên gundî û dûr
- Xwendekarên astengdar.

Zêdetîr hîn bibe:

edu.nsw.link/equity

https://education.nsw.gov.au/public-schools/selective-high-schools-and-opportunity-classes/general-information/translated-resources



## Alîkariya darayî

edu.nsw.link/pubedu

Public Education Foundation scholarships ji bo alîkariya ciwanên li dibistanên giştî yên NSW ji bo xwegihandina derfetan û gihaştina imkaniyatên xwe, alîkariya darayî pêşkêş dike.

*Ji kerema xwe ji bîr nekin ku ji bo sepandin û testa cîbicîkirinê ti xercên dibistanê nînin û ji bo qeydkirina lîse yan jî dersa derfetê ya bijarte tu xercên dibistanê tune ne.*

## Ji bo serlêdanê xwe amade bikin

Di malpera me de agahîyên zêdetir bistînin

### Servîsa wergerandinê ya telîfonê

Heger pêdivîya we bi alîkarîya wergêran hebe ji bo ku hûn bi mamosteyê pola zarokê xwe re biaxivin, ji kerema xwe di 131 450 de li Xizmeta Wergerandina Telîfonê bigerin û bi zimanê xwe wergêrekî bixwazin. Ji operatorê re hejmara telîfonê ya ku hûn dixwazin lê bigerin bibêjin û ji bo ku di axaftinê de bibe alîkar wê operator li ser xetê wergêrekî bistîne. Ev xizmet belaş e.